NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993



<u>Xebat ji bo :</u> *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
*Email :* **Newroz95@hotmail.com**

Hejmar(68 ~69) Hizêran~Tebax 2006 z~2618 k Buha (15 ) p.s


# Di ber zimanê dê de, Çar camêr hatin girtin

Roja 4-ê heyva Tebaxa 2006 an, di bin destê şevê de, li bajarê Helebê, taxa Eşrefiyê, karbidestên dewletê, dest danîn ser çar camêrên Kurd. Hê jî li ba hêzê parastiniyê girtîne û nedane tu dadgehên aşkere, ne jî rê dane xwediyan ku, serekî li wan bidin, da wan bibînin, ka rewşa wan ya tendirustî çawa ye!?. Ew girtî jî, ev hemwelatiyên he ne :



*Ibrahîm Xelîl*

**1** - Îbrahîm Xelîl kurê Rehman- 1948- ji gundê Naza, nahiya Şeran , herêma Efrînê , Xwediyî heft zarkonan e ( Nezmî, Nûrî ,Zêneb, Emel, Cîhan, Fatme û Mihemed



*Selah Mihemed*


**2** – Selah Mihemed Bilal kurê Mihemed – 1971 – ji gundê Zerka, nahiya Reco, herêma Efrînê, xwediyê sê zarokan e ( Stêvan, Sozdar û Nêçîrvan ) .

**3** – Mihemed Ebdo Xelîl – 1964 – ji gundê Qitmê, nahiya Şeran, Herêma Efrînê, bi jin e.



*M.Ebdo Xelîl*

**4** – Ezet Osman kurê Husên – 1973 –ji gundê Kurkajêrîn , nahiya Mabeta, Herêma Efrînê, bi jin e.



*Ezet Osman*


Ew hemî li Helebê bi cî û war in. Di nav civakê de, bi Kurdewerî, mirvhezî û destpaqijiyê têne nasîn.

Derbary vê bûyerê, komîta rêzanî ya Parta Yekîtî ya Demokra a Kurd li Sûriyê, daxuyanek bi zimanê erebî da

**D.M ( R 12)**


www.avestakurdi.org

## Heval Bavê Elî jî bar kir



Roja 3ê Tîrmeha 2006 an, hevalê hêja Mihemed Elî Îbrahîm( bavê Elî), ji gundê Abûdanê. Nahiya Bilbilê., herêma Efrînê, ji dunyayê bar kir. Bi beşdarbûna gelek dost, heval û berketiyan li goristana kela Horî hate veşartin. Bila zaro, heval û dostên wî xweş bin.Bijî gelê Kurd.

## Heval cemal çû dilovaniya xwe



Di 17-8-2006 an de, piştî êşeke ji nişkeve, heval Cemal Hebeş kurê Ehmed – ji gundê Kêla- herêma Kurdaxê- jiyana xwe ji dest dide. Bi beşdariya xwedî, heval û dostên wî, li goristana zareta Henên ( Efrînê ) binax dibe. Di gel wê, rikxirawa partiya YEKîTî, bajarê Herlebê gotina xatirxwastinê li ser dixwîne.

Bila serê xwedî, heval û dostên wî sax û ciyê wî bihuşt be.

## Xelatkirina Bi Xweşî


Rêxistina P.D.Ks Li Ewropa, yekem care, di xweşiya mirovan de, xebatkarekî xwe xelatdikin. Ji ber, Kurd hobûne ku, xebatkarên xwe piştî mirnê bêne xelatkirin . Bi beşdariya berpirsiyarê rêxistina YEKîTî li Ewropa û hin hevalan, xebatkarê Kurd, Edîb Ibrahêm, ji gundê Maratê, herêma



Kudaxê tê xelatkirn. Hêjayî gotinê ye ku, xebatkarê me E. Ibrahîm, bêtirî 30î salî, xebata xwe di nav tevgera Kurd dededomîne û berî çûna wî ya Ewropa, endamê komîta rêvebir ya belavoka NEWROZê bû û bi pênûsa xwe , rûpelên Nwrozê dixemlandin.

Em bi nave Komîta rêvrbir û hemî xewndevanên Newrozê. hêviya tenduristiyeke baş jêre dixwazin.

## Heval Nîhad jî çû dilovaniya xwe



Li 11-8-2006 an, heval Nîhad Xelîl kurê Zêdo, ji gundê Mîdanê, herêma Kobaniyê, bi nexweşiya xwînseknandinê diçe ser dilovaniya xwe. Bi beşdariya xwedî, heval, dost û gundiyên wî li gorista gundê wî tê veşartin. Ji ser goristanê, hevalekî wî, gotina partiya wî P.Y.D.K.S xwend**.**

Bi vê boneyê, em sere xwedî. Dost û hevalên wî saxzdikin .

www.arsivakurd.org

# Hevpeyvînek ligel sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê – Mihiyedîn Şêx Alî - Hevpeyvîn: Xalid Heno - Malpera Avesta

www.avestakurd.net

*** Birêz Şêx Alî,di serî de xazim hûn, xwe bi xwendevanên Avesta bidin nasîn... Şêx Alî kî ye?**

Li bajarê Efrînê sala 1953 –an hatiye dinê. Li dibistanên Efrîn, Heleb û unîvêrsîta wê – beşê ingilîzî – xwendiye, bê ku bi dawî bike.



Di warê perwerdebûna siyasî û kartêkirina mirovane de, li Helebê di salên (1969 – 1973) –an de ligel Dr.Nûrî Dêrsimî, û li salên (1980 – 1993) –an li Þamê li gel Osman Sebrî weke şagirtekî têkildar bû.

Dê Kurd e, ji gundê Coqê – herêma Kurdaxê – ji êla Çeqeliyan, navê wê Hebîbe ye. Ji kurdî pê ve tu zimanên dî nizane . Bav jî Kurd e, koçer e, ji êla Delkî – Mîrşemî, ji gudê Berbiyan – herêma Îslehiyê – navê wî Şêxmûs e . Piştî serkeftina Mistefa Kemal, hikûmeta Anqerê paşnavê Mîrşem ji defteran rakir û paþnavên tirkî mina Ataş, Ûnlu, iliksoy, kose, Aksoy….xistine şûnê . Îro ew koçerên Mîrşemî bi sedan mal û kes li bajarên Îslehiyê, Entabê, Meraş û Istenbolê bûne bajarvanî, bi cî û war in . Dema şerê Seferbirlikê (1914-1919), Þêxmûs derbazî gundê Dêrsiwanê – hêla Kurdaxa Sûriyê – dibe, çend salan lê dimîne, dû re berê xwe dide Efrînê û tê de dibe xwedî hin berjewendiyên aborî . Ew nozdeh sal û şeş mehan di hêza leşkerî ya firansiyan de weke zabitekî biçûk dixebite . Ta îro jî alikariya diravî ya mehane ji dewleta Firansî ji bermaliya wî re berdewam e . Li gel mezinê Êzdiyên Kurdaxê Derwîşê Şemo – gundê Qîbarê -, Kamîran Bedirxan û Rojê Lêsko têkildar bû . Ji bilî zimanê xwe yê Kurdî bi Tirkî û Fransî jî dizanî .

Li Efrînê, li 1968 –an Sêx Allî derbazî nêv tevgera siyasî a Kurd dibe û li havîna 1972 –an, ji ber xwendevanên kurd li Helebê tê helbijartin û digel hevalên dî diçe li kongira yekem li payîza 1972 –an ya ku bi rêvebiriya birêz Reşîd Sindî nûnerê nemir mile Mistefa Barzanî li nêzî Bamerna Kurdistana Îraqê beşdar dibe, Vêca ji hîngê ve û ta niha jiyana xwe terxî Tevgera Kurd kiriye, ji siyaset û rewşenbîriyê pê ve, di tu warên dî de kar nekiriye . Li 1974 – an belavoka Azadî – Elhuriye – li ser navê komîta herêma (Kurdax, Heleb û Kobaniyê) bi alikariya hin hevalên dî derdixe û dide belavkirin . Di kongira diwem ya partiyê ya ku li Sûriyê 1977 –an hatibû lidarxistin ew bona rêvebiriya partiyê tête helbijartin û dibe endamê komîta navendî û dûvre ya siyasî . Li →

payîza 1981 –an, ji ber gelek pirs û sedeman nemaze (pêdiviya helbijartinan di nav rêxistina partiyê de li herêma Cizîrê – helwesta li berambar Komela Mirteda ya Cemîl Esed birayê serokê Sûriyê yê berê Hafiz Esed , hêrişa Mistefa şemran û Ayatulah xilxalî li dij Mahabadê û kuştina gelek kadroyên P.D.K-Îran - pirsa demokrasî û çêroka helbijartina perlemento li Sûriyê – pêdiviya serbixwebûna rêxistina partiyê li Ewropa …hwd), cudabûn dikeve El-partî, û partiya Kar a Demokrat a Kurd li Sûriyê tê holê, kar û barê birêvebirina vê partiya nû weke sekretêr heya 1990 –î bi Şêx Alî dihate hilpesartin . Dûv re, ligel hin baskên Tevger a Kurd li Sûriyê ( 1990 – 1993) nemaze ligel baskê El – partî (Xêza Kongira 1988 ) ya ku, bi serkêşiya Mamoste Îsmaîl Omer û Salih mile Silêman yekîtî tê avakirin, û ew dibe endamê komîta siyasî . Di herdu kongirên dawî ya parta Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (2001-2005) Îsmaîl Omer weke serok û Şêx Alî weke sekretêrê partiyê têne helbijartin û ligel endamên dî yên komîta serkirdayetiyê kar û barê partiyê birêve dibin .

*** Hûn weke yek ji berpirsiyarên P.Y.D.K.S, gelo sedema zêdebûna partiyên Kurd li Suriyê çi ye, di nêrîna te de sûda vê yekê li çareserkirina pirsa Kurd heye؟**

Ev reng pirbûn û zêdebûna rêxistinên kurd li Sûriyê, sûdê li çareserkirina pirsa Kurd nake . Ji bilî vê yekê, ew kêm zêde, rê li ber xelkê kurd û raya giştî wenda dike, û rê dikeve serberdayetî û keysebaziyê .

Sedemên vê rewşa aloz û tevlihev bi heceyî lêveger û nirxandina qonaxên ku Tevgera Kurd tê re derbaz bûye de ye, bi hewceyî lêkolînên zanistî, diyalog û danistandinên berpirsyar, berfireh û aşkere ye . Gelo berjewendiya gelê kurd li Sûriyê çi ye ?...pêvajoya jiyana wî ya civakî, aborî û rewşenbîrî serûber di çi çerçewê de ye, û çendî bi civaka Sûrî ve girêdayî û di nêv hevd e ye ?. Ûli gor naskirina vê tabloyê, partiyeke kurd gerek çi bide berxwe, da ku, karibe bi cî bike, gavan bavêje û bi serkeve . Ev yeka he, dixuyê hê li ba gelekan ne zelal e, di hiş û seriyan de baş cî negirtiye . Eve sedema yekemîne ango dihêle tevgera kurd li Sûriyê di aloziyê de bijî, ji ber binale û rê li ber durişmên mezin û neberpirsiyar, siyasetên çewt û nexweşiyên ezîtiyê vebe .

Sedema dî ya herî sereke heyama – etmosfîra – siyasî li Sûriyê û pirojeyên rijîma dewletê li derbareyî gelê Kurd, tunebûna Alfebeya demokrasiyê ye . Eve bêtirî çel salî ye ku Sûriyê di bin bandora dadgehên awerte, Ehkam Urfiyê – siqi yonetim – û karbidestiya tekpartiyê de ye …lewre jiyana siyasî, rewşenbîrî û civakî ya civaka Sûriyê ser û ber di asteng û aloziyan de digevize . Bi ser de jî bandor û kartêkirina têkliyên hêzên Kurdistana Îraq û Tirkiyê bi rijîma Hafiz Esed re, bez û kelkela gelekan ji siyasetvanên Kurdên Sûrî ku xwe li ber wan reng têkliyan germ bikin û di nav gel de cî bigirin, bê ku xwe bibînin ku nûnertiya pirsa Kurd li Sûriyê dikin, û dadmendiya ev pirsa he, ne kêmî dadmendiya pirsa Kurd li Tirkiyê an Îraq û Îranê ye. Tevî→

www.arsivakurdi.org

taybetmendiya rewş û dîroka kurd li Sûriyê

*** Rêjîma Sûrîyê roj bi roj ber bi rûxandinê ve diçe, hûn pêşeroja rêjîmê çawa dibînin... amadekariyên we ji bo guhertineke ku, li Suriyê çêbibe çi ne؟ .**

Baweriya me li cî ye ku, pêşeroj ne ji rijîma Sûriyê re ye. Lê mirov ne di wê gumanê de ye ku, têkçûn û rûxandina rêjîmê ewqas nêzîk di van mehên bên de ye . Hazirî û amedekariyên parta me di sê warên sereke de lidar û berdewam in :

A- Em dixebitin da ku karibin Tevgera Kurd li Sûriyê bidine ser hev . Di vî warî de, lihevkirin û karê hevpar di navbera Hevbendiya Demokrat a Kurd û Berê Demokrat a Kurd de li Sûriyê, û belgeya nêrîna hevbeş ya ku herdiwan li ser erêkirine, gaveke erênî û li pêşe, bi hêviya ku ev nêrîna he bibe belgeya tevahiya tevgerê .

B- Xebata hevpar û têkiliyên dostaniyê ligel hêz û partiyên Sûrî yên rikebir (Opozisyon) di çerçewa danezanîna Şamê li cî û berdewam e, li seranserî bajar û herêmên Sûriyê komîte û Encûmen hatine û têne avakirin .

C- Karê rojane ya rêxistinên partiyê li seranserî herêmên Kurd li Sûriyê li saz û berfirehtir dibe . Rola rêxistin û kadroyên me di warê civakî, rewşenbîrî, ragihandinî û xwedîderketin li zimanê dê, roj bi roj bêtir cî digre û li ba xelkê Kurd dibe ciyê rêzgirtinê .

*** Hinek kes partiya we tewanbar dikin ku hûn ne aktîv in û xwe ji xebatê didin alî, şexsê we bi vê yekê tewanbar dikin, hûn çi dibêjin؟**

Her kes li gor zanîna xwe azad û serbest e çi bêje . Lê, mirov ji bîra neke ku azadî û berpirsiyartî divê ji hevdû cuda nebin . Bi qasî em dizanin û dikarin, siyaset û biryarên partiyê em diparêzin û di ber de dixebitin, da ku mirov karibe rû li rû, li pêş hevalên xwe, li beramber dîrok û pêvajoya pirsa gelê xwe û ya mirovatiyê xwedî rol û helwest be .

*** Li gora we opozîsyona Ereb li Suriyê heya çi radeyê amadeye bi Kurdan re bixebite û mafên Kurdan yên rewa nas bike؟**

Piraniya kadro û birêvebirên Opozisyona Ereb li Sûriyê bi salan di zîndan û girtîgehên Sûriyê de, di merc û hoyên zor dijwar û nemirovane de, jiyana xwe borandine . Ew di hejmara xwe de ne hindik in, li seranserî bajar û parêzgehan têne dîtin û di nav xelkê de ciyê rêzgiritinê ne . Parta me bi piraniya wan camêran re, rasterast têkildar e . Ew dikarin guhdarî te bikin, bi ser xwede mijûl bin û biponijin. Ew dadmendiya pirs û hebûna dîrokî a Kurd li Sûriyê li ba wan hêdî hêdî baş ciyê xwe digire, nefret dikin û dibêjin na ji siyaseta şoven û setemkar re ya ku rijîma Be,is di derheqa Kurdan de dajo . Bi rastî û li gor me, em dibînin ku pêwîstiyeke dîrokî ye ku em li gel vê Opozisyona demokrat, mil li mil karê hevbeş bikin û bidomînin . Di pêvajoyeke weha de, em dê di wê hêvî û baweriyê de bin ku

**D.R (12)**

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîn bi mamoste Nesredîn İbrahîm re
## - Sekreterê partiya dîmoqrat a Kurd li Sûrya ( Alpartî)

**Mamoste, weşana NEWROZ dilxweş û şa ye ku, di vê hevdîtinê de li we guhdariyê bike, raman, hizir û bîrbaweriyên we, derheqa derd û êşên gelê me yê Kurd biguhêze xwendevanên xwe. Gelekî bi xêr û xweşî hatî.**

**B** *-Di destpêkê de ez sipasiya* ***NEWROZÊ*** *dikim. Bi rastî ew stêrkek geşe, di warê wêjeya kurdî de,hemî cûre tê de peyda dibin, ez yek ji xwendevanê wê me.*



**1-Piştî van guhertinên mezin di hemî warên jiyanê de li cîhanê, hûn paşeroja gelê Kurd bi tevayî û gelê me yê Kurd li sûriyê bi taybetî çawa dixwînin?**

*-**Bê** goman ev guhertin bingehîn in, ji ber li ser tuştine taybetmendî ne. Belavkirina demokrasiyê yek ji navnîşanên wê ye. Herifandina Yekîtiya Sovyêt, rijêma Talban û ya Şawşîsko, ji hêlekê ve, ji hêla din ve jî roxandina rijîma sedam ê dîktator,bicîkirina fedraliyetê li Kurdistana Başûr, ev guhertinê han senter bûn di herema me de, bêgoman wê rola xwe biguhêze dewletên derdorî xwe . Ji ber bayê demokrasiyê rabûye, û miletê Kurd wê ne derveyî van guhertinan be li hemî parçên kurdistanê.*

**2- Hûn rewşa Tevgera Kurdî li Sûriyê çawa dinirxînin? Çi kar û xebat ji bal partiya we ve ji bo yekirina gotina wê dibe?**

***B-*** *Di van rewşên awarte de, ku bihtir ji 40 salî li welatê me, tê meşandin Tevgera Kurdî ta nuha kariye hebûna xwe biparêze. Li gor Kanîna xwe, pirsgirêka kurdî pêşde dide. Ji aliyê din ve jî, xal in hene ji wan dikaze, weke parçebûna ne suruştî ya balkêşe. Nuha em hewil didin ku tevger were ser hev. ji vê me xwest ku DÎTİNA HEVBEŞ bibe programek siyasî, û gerek em haziriyê ji kongirek netewî Kurdî re li Sûriyê bikin. Y bihtir giring avakirina LÊVEGEREK Krdî ku karibe nûnertiya miletê me yê Krd li Sriyê bike.*

**3- ENÎ û HEVBENDÎ ya kurdî di ragihandina Şmê de cih girtine,hin gazin têne kirin,ku di belgenameya wê ya bingehîn de , mafên gelê me yê Krd bi xurtî cih negirtine. Di vî warî de hûn çi dibêjin ?**

***B-*** *ev cara yekem bû ku,me karîbû hebûna doza kurdî li bal opozisyona demokrat li sûriyê bidin çûnrayêkirin, agihandina Şamê bi xwe jî tîpne qalind in , daxwazê endamê xwe teva têr nake,lê belê xal in hevbeş di navbera wan de peyda bûne û bûye bingeha pêşveçûna demokrasiyê. Ya balkêş ew e ku, ev ragihandin qizinceke mezin û gaveke hêja ye .*

**4- Îro HEVBENDÎ û ENÎ ya Kurd karên hevbeş bi hevre dikin, ev yeka han cihê dilxweşî û pîroziya gelê me yê Kurd e. Gelo hûn di HEVBENDÎ û ENÎ yê de hewil didin ku encumenek** →

www.arsivakurdi.org

**kurdî li Sûriyê bê avakirin, hemî hêz û rêxistinên kurdî û kesayetiyên xweser cihên xwe têde bigrin?**

***B-*** *Têkiliyên di navbera* ***ENÎ*** *û* ***HEVBENDÎ*** *yê de, divê pêşkevin. Yê me wek partî tu problem li ba me nînin. Em dixwazin ku ev dîtina hevbeş bibe ya Tevgera Kurd bi tevayî. Nêzîk, rûniştinek heye ji bo pêkanîna encumenek Kurdî li Sûriyê. Gerek rêxistinên Ttevgera Kurd hemî têde cih bigrin, hêviya me ew e.*

**5- Wek hatiye naskirin dan û standin di navbera we û P-Y-D-K-S de hene ,û win bi karine hevbeş radibin , ta bi çi radeyê ye pêşketina vê yekê?**

***B-*** *Ev biryar di navbera herdû partiyan de istiratîcî û gelekî li pêş e, em bi hêvî ne bigihe qûnaxa yekîtiyê. Hêviyên min li ser vê gelekî hene ku pêşkeve. Ji ber nêrînên me nêzîkî hev in, em xwe dibînin wek partiyek, em bi hêvî ne ku fireh bibe bi rengekî nû û li ser bingehek demokrat. Bêyî vê , wê zehmet be tuştek pêşkeve.*

**6- Piştî rûniştina ENÎ û HEVBEDÎ yê bi cîgira serok komarê sûriyê re, ji bo vegerandina nasnamê li Kurdên ku, di 1962 an de hatibûn kişandin, ta bi çi radeyê hêvî li ser têne girêdan?**

***B-*** *Bê goman piştî hatina serok Beşar Elesed, hêvî li ser pêşvebirin û nûbûnê hatin girêdan. Lê mixabin ta nuha ew sîstema kevin hê dişopîne, em tu hêviyan li ser girênadin. Lê ev dîtin, em wê pozitîv(erênî) dinirxînin. Ew jî hatiye ji hilguvaştina ku, li ser rijêmê tê meşandin, gerek dîtin bi tevgera kurdî re be. Ya dîtir, gerek em hay ji hevdû hebin, em bi hevre herin yan bi hevre neçin. Ewan da xuyakirin ku, ev nasname wê rewşa wê bê çareserkirin. Berê jî soz hatibûn dan,em hêvîdarin vê carê rast be.*

**7- Di warê geşkirina wêje, çand,folklor,û zimanê kurdî de , partiya we çi karî îro dike**

***B-*** *Li ba me kovarek bi navê* ***(JÎN)*** *heye , bi kurdî û erebî ye, jimara wê gihaye 101 ê,* ***ROJ*** *û* ***AZADÎ*** *jî du kovar in heremî ne, yek li Cezîrê, ya din li HELEBÊ derdikeve. Komîtên fêrbûna zimên hene, em dibînin gerek ji wilo kar bihtir b. Lê rewşa zimên li ba hevalên YEKÎTÎ baş li pêş e û guhdan lê baş dibe.*

**8- Eve 67 hejmar ji weşana NEWROZ a du mehane bi temenê /10/ salan belav bûne . Hûn derçûna vê belavokê çawa dibînin, çi rexne û kêmasiyan lê digrin mamoste ?**

***B-****wek di pêşde min got bi rastî NEWROZ stêrek geş e bi gelek tuştan ve mijûl dibe, berdewamiyê ez jêre dixwazim , bi hêvî me roj bi roj pêşkeve .*

**9- Bê gomane ku zimanê me nasnama me ya netewî ye, ji bo fêrbûn û fêrkirina zimanê dayika me, hûn ji keç û lawên gelê xwe re çi dibêjin ?**

***B-*** *ez bi hêvî me keç , law û hemû kesên Kurd taybetmendiyekê bidin zimên. Ji ber ew nasnama me ye . Tevgera Kurdî di vî warî de tuştin baş kirine .*

**10- Gotina te ya dawî ji xwendevanên NEWROZ re çiye mamoste ?**

***B-*** *silavên min li ser rûpelê NEWROZ ê ji hemî karmend û xwendevanên wê re rêdikim, NEWROZÊ bixwênin û bidin xwendin.*

**Ji kûrbûna dilê xwe , mamoste em we sipas dikin**

www.arsivakurdi.org

**Tendurustî**

# Jana Xûnxizanya Dil"JXD"

Jana xûnxizaniya dil, sedema yekê ye ji mirinê re li Bakurê Amerîka. Sedema wê tengbûna rihên ku dil bi xûnê avdidine. Tengbûna rihê Koronerî yê dil belkî bêdeng û veşartî bimîne, lê gelek caran mîna Înfarkşinê "xetmandina" yan Encaynayê "tengbûna" rihên dil dertê. Mirovên ku JXD vê re hene 33% ji wan bi Înfarkşina yekê dimrin. Ji ber wê jî, xwevegirtina ji JXD bi riya guhertina sedemên xedariya wê derfetên nexwaşiyê û mirinê pir kêm dikin.

**1. Hêmanên xedariyê çi ne?**

Sedem yan hêmanên xedartir ev in: Nedurustbûna qatiqê xûnê, bilindbûna tensyona xûnê, şekir, vexwarina titûnê ne. Ji bilî wan hêmanin din yên xedar



hene, mîna hebûna JXD di temenê biçûk de di malbatekê de, li ba mêran, li ba jinan piştî kirasbirînê û lipata hindik ev jî derfeta hatina JXD bêtir dikin. Lê ya rast, hebûna bêtirî hêmaneke xedar derfetên peydabûna JXD bilind dike.

**2. Sererastkirina hêmanên xedariyê.**

Durustkirina hêmanên xedariyê derfetên gurbûna JXD pir kêm dike. Ew bi van ûêweyan dibin:

- Qatiqê bilind. Gava ew di xûnê de bilind dibe, mirov dikeve bin metirsiya JXD. Û gava du hêmanên xedariyê peyda bibin û Kolîstrol jî 130 mg derbas bike, derfeta bûna JXD eşkere û bilind dibe. Qatiqê xûnê bi parêziyê tê
.
kontrolkirin.

- Tensiyana xûnê. Ew derfeta xedariya JXD û rawestana "sekinandin" dil bilind dike. Gerek tensiyon 140/90 derbas neke. Gava ew li ba yekî peyda bibe, gereke lê miqate be û herdem haya wî jê hebe.
- Vexarina titûnê. Xedariya JXD bêtir dike û rola hêmanên din jî xort dike. Eger mirov titûnê berde, piştî sê salan derfetên xedariya JXD li ba wî mîna yê ku cixarê venaxe dibe.
- Şekir. Hebûna jana Şêkir di temenê biçûk de derfeta hatine JXD bilind dike. Ji lewre jî, haydarî bi controlkirina şêkir tum gereke.
- Li ba jina, piştî dema kirasbirînê, birina hormona Estrocênê derfete JXD nizim dike.
- Hêmanê xedariyê yên din, mîna jiyana bêlebat û qelewbûn. Gava mirov giraniya laşê xwe daxe û heftê sê caran nîv katê werzişiyeke negiran bike, xedariya peydabûna JXD kêmtir dibe.

**3. Rola Espîrîn.**

Gava bêtirî hêmanek xedariyê li ba mirov peyda bibe, Espîrîn (75-325) mg/hev/roj, vegirtinek baş ji xedariya hatina JXD çê dike. Lê netê wê wateyê ku her mirovekî temenê xwe di ser çelî re be gereke bibe, na wek me got gerek hêmaneke xedariyê li ba wî hebe.

**4. Serencam.**

Wek serencam û da ku mirov ji JXD were parastin, jê tê xastin li van çend egeran miqate be: Qatiqê xûnê, tansyana xûnê, şekir, vexarina titûnê, birina Estrocên li ba jinan, jiyaneke livok bijî û laşakî sivik tîmar bike

www.arsivakurdi.org

# Yadeya 49 Saliya Vejîna Kurd

**Dr. Rozad Elî**

**Li** 14 Hezêranê, yadeya 49 an ya damezrandina "Partî Demoqratî Kurd li Sûryê" derbas bû. Yadeya damezrandina yekemîn rêxistina siyasî ya Kurd li Sûriyê, yadeke pir watedar e, li ba Kurdan cihê qedir û serbilindiyê ye û li ba dijminên gelê me jî cihê nerazîbûn û diltengiyê ye. Ji ber wê jî bûye boneyeke zor watedar, hemî partî û rêxistinên me, bîranîna wê pîroz dikin.

**Siyaseta dewletê di salên pênciyan de?**

Di navbera deh salan de, ji serbixwebûna dewleta Sûriyê, kes û partiyên şofenîst û nijadperest ên Erebî, kanîbûn bi hêz derbas nav laşê dewletê bibûna û saziyên wê di bin îrada xwe kirana. Ji wê hîngê ve, wan siyaset û pêlanên nijadperest li dijî hebûna gelê Kurd li Sûriyê gerandin, înkar û tunekirina miletên din li Sûriyê mîna bingeh ji siyaseta xwe re dibirin. Nedixwastin rastiya hebûna gelê Kurd li Sûriyê bibînin. Digotin Kurd li Sûriyê tunene, yên hene jî, çendek in, penaber in, ji Tirkiyê hatine û axa Ereban zep kirine, yanê ew ne ji vir in, xaka wan li vir tune ye, mêvan in, bi warê xwe ve negirêdayî ne. Ji lewre jî, gereke her kesê ku, di nav sînorên Sûriyê de dijîn Erebkirinê bipejrînin..

Li ber roniya wê ramana nijadperest, wan mafên gelê me yê Krud li Sûriyê rewa nedidîtin, lê mikûr nedihatin, û ji wê hîngê ve û ta roja îro, bi her awakî pêkol dikin da ew ramana şofen bikin sazî û siyasetên dewletê re siyasetke fermî ji hemî.

**Rewşa gel û civata Kurd çi bû?**

Li wê demê, berî pêncî salî, piraniya xelkê Kurd, gundî, nexwende , çav girtî bûn, xwe nedinasîn, nizanîn Kurd û Kurdayetî çî ye û çawa gereke kesayetiya xwe biparêzin. Ew bibûn wekî ku bi qeder û qismetê xwe razî bibûn, li ber lehiya şofenîstê dest û pê ji ber xwe berda bûn û pêde diçûn, parastina hebûna xwe û bicihanîna mafên xwe yên netewî ne li bîra wan bû. Dewlemend û axayên Kurd jî, wek adetê, tenê berjewendiyên xwe diparastin û xwe bi dezgeha dewletê ve girêdidan. Û gava ku Kurdekî hewldida doza Kurdayetiya xwe bike, toşî zordariyê dibû û bê erê-na davêtin binê zîndanan.

**Pêwistî bi rêxistineke siyasî**

Di nav van rewşên paşketî û xirab de, tenê du rê li pêş zanayên Kurd hebûn:

**Yan** siyaseta şofenîstan bipejrînin û her tiştê ku navê xwe Kurd, were jibîrkirin û li dwaiyê bêjin em Ereb in, ev jî tiştekî pir zor bû, ustubariyeke dîrokî bû û bi biryaran netê meydanê.

**Yanê** jî, gerek bû ku, bi ustubariya xwe ya dîrokî rabin, erkên xwe yên netewî û Kurdayetiyê nas bikin. Pêwîst bû bi gelê xwe bidina zanîn, ku Kurd jî miletek e, mafê wî jî di hebûn û mayînê de heye, ew jî xwedî ziman, çand, kultûr, xak û dîrok e û ji miletên cîhanê yên →

www.arsivakurdi.org

din ne kêmtir e. Ji lewre jî, gerek e ew rojekê pêş ve xwe nas bike, doza mafê xwe bike û hilde ser milên xwe. Ji pêkanîna van tiştan re jî hebûna rêxistineke siyasî dibû wek erkeke bingehîn, da ku hemî kurdperwer kanibin bi hev re di bin sîwana wê de bicivin û xebateke bi rêkûpêk bikin.

## Çawa Partî cihê xwe di nav gel de girt?

Gava ew çend camêrên têkoşer li roja 14 hezêrana sala 1957 an li hev civîn û daxuyaniya xwe belav kirin, belkî wan bi xwe jî bawer nedikir ku rojek dê were, civîna wan a biçûk, dê fereh bibe û hemî Kurd dê lê bicivin. Bi rastî jî, çend sal neçûn, navûdengê "Partî demoqratî Kurd" gihîşte her Kurdekî li seranserê Sûriyê, kom û komikên wê li her gundekî û li her deverekê damezrîn. Pir bi lez û bi hêsanî lê bi xortî û bi coşeke mezin li seranserî herêmên Kurdan li Syriyê belav bû û bû partiya yekê. Ji lewre jî, ji destpêkê ve, dewletê hesabên mezin jê re kirin û herdem bi dehan endamên Partî di bin çavan de û di hepsan de bûn, rêberên wê jî yan di girtîgahan de bûn yan jî ji hêla polîsan ve dihatin şopandin. Lê li dirêjahiya pêncî salî, û digel hemî têdbîrên dewletê û zora xwe, ew bi ser neket, û tevgera me ya Kurdî, ma xort bû û her diçe xort dibe, Kurd jî her diçin şiyar û pêdar dibin û ji doza xwe venagerin.

## Partî û gel?

Emê ji xwe bipirsin, eger têkoşerên destpêkê ên qehreman "Partî" çê ne kiribana, gelo! roja îro, rewşa gelê Kurd li Sûriyê dê çawa ba? Kes nikane nebêje, egre ku ne bi saya xebat û rêbertiya tevgera me ya siyasî ba, hişyariya gelê me yê Kurd li Sûriyê dê di deraqekî zor xirab de ba. Roja îro, lawên Kurd, ên ku bi şîrê tevgerê mezin bûne, serê xwe ji dijminan re danaxin, bi lehengî doza xwe ya netewî û azadîxwaz diparêzin û xirabiya dijminê hebûna Kurd li sîngê wî vedigerînin.

Wekî ku roja îro em dibînin, raman û siyasetên dijminê gelê me, yên ku ji pêncî salî bi ser me de dajo, di ancamê de bi serneketine, wî nikanî rastiya hebûna gelê Kurd li ser axa welatê xwe veşarta. Lê mixabin, digel hemî guhertinên ku li dunayê dibin, dewletê siyaseta pişaftina gelê Kurd û jiholêrakirina "Partî" neguhert û hîn bê navber didomîne. Li bervajî wê, tevgera me siyasî, mezin û bi hêz bûye, bûye serê rumê di xebata demuqrat de, ne li herêmên Kurdan tenê, lê li seranserî Sûriyê jî. Belkî li Sûriyê, civaka ku herî bi siyasetê de mijûl dibe û dixebite civaka Kurd e. Li vê demê, xebatkarên me netenê barê doza xwe hilgirtine, ew germahiya didin derdora xwe jî, hêviyan diçînin û di paşroja gelê Sûriyê û azadiya wî de bi xortî mijûl dibin. Bêguman, ev jî hemî ji berhemên tevgera me ya siyasî ne.

## Gel li benda tevgerê ye!

Ji bo milet û civateke mîna ya Kurd li Sûriyê, ku bi deh salan ji her aliyekî ve tê êşandin û guvaştin, tenê mijûlbûna bi siyasetê ne bes e, zor pêwîst e tevger bi karûxemên civatê yên din de jî mijûl bibe. Xebateke xort di warên din de pir giring e. Ji ber ku, gel, mirov û civat, netenê bi zanyariya siyasî li ser xwe disekine û pêş de diçe; ew bi çand, aborî, ziman, civak û siyasetên rast û baş li ser xwe dimîne, pêş diçe û jîndar dibe. ⟶

www.arsivakurdi.org

Lê mixabin mîna em dibînin guhdana tevgerê bi mijaran ku li jor jimartine, pir qels bû û hîn jî wilo ye. Ew jî dihêle ku komelgeha Kurdî li Sûriyê li ser zemînekî sist û lerzok bimîne, wê lomê jî dê nikanibe, mîna ku tê xwastin, xwe li hember pêlanên şofenîstan ragire û bi zanebûn berxwe bide.

Li vê demê, civata me toşî pir pêlan û rûdawên civakî yên ziyandar û nebaş dibe, xizanî, nezanî, bêkarî, windabûna çand û kesayetiya netwî, jibîrkirina zimên û gelek sincî û karûbarên sexte, ji govdê gelê me dixwin, pir gereke ku tevger, di pir waran de, bi ustubariyên xwe rabe, çimkî ew jî ji lîsk û pêlanên dijmin tên û xizmeta armancên wî di dermafê gelê me de dike. Pir giring e mirovê Kurd were parastin û daxwaza dijmin bi ser nekeve. Birastî rola tevgera me ya siyasî ji berê ve di wan waran de pir lawaz e û çihê xemxarî û rexna giran e.

## Roja îro çi têxwastin?

Roja îro, gelê me li ser riya hişiyariyê ye, xwe naskiriye, tiştên baş û nebaş ji ser hev derdixe, mafên wî li ba hemiyan diyar bûne û hêviyên wî jî bilind bûne. Bi van rastiyên bicihatî, nû û pîroz re, ustubariyên partiyên me jî pir dibin, dijwar û giran dibin. Wê lomê jî pêkanîna pir tiştan ji tevgerê tê xwastin. Zor pêwîste ku ew, çi di warê ramanê û çi jî di hêla şêweyên xebata xwe de xwe biguhêre û nûjen bike. Gava ku partiyên me xwe ker bikin, dengê gel nebihîsin û li xwe venegerin, ji mafê gel e rabe hesabên pir tiştan ji partiyan û rêvebirên wan bixwaze.

Di vê pêvajoyê de, daxwaze herî lezok, pêwîst û rewa ku her Kurdek dixwaze û pê bang dike, **yekbûn** e. Yekbûna rêxistin û partiyên me, berdêla perçebûna tevgerê ye. Bila em di nav hev de, bi pir zimanan bipeyvin, qet nexeme, lê li hember raya giştî, û di nav gele de gerek e dengê me yek be, şora me li hev be, bila gel yekbûna tevgera xwe bibîne, pê hestewar û bi hêz bibe. Dijmin bi perçebûna me kêfxwaş dibe, gel jî bi yekbûnê kêfxwzş ev e rastî, belê, perçebûn me lawaz dike, û ya din jî me xort dike.

Pêkanîna yekbûnê jî ewqas ne dijwar e, ji ber ku, ew bi me ve girêdayî ye, bi destê me ye. Erê dijminên mafên me bi hemî kanînaên xwe li hember pêkanîna wê radiwestin, lê gelê me jî pir dîtiye, pir kişandiye, pir daye, gava dibîne rêberên partiyan li pêş yekbûnê dibin kelem, jê re kar nakin, bi cih nînin, hîn carina jê re dibin asteng û partiyan perçe dikin. Wê hîngê ew têdigihê ku çawa rêberên partiyan û dijminên gel di vê xalê de digihên hev. Wê hîngê milet nabêje ev partî baş e yan yê din qenc e. Ew tevan bi mêzînekê dipîve û bi wan re dibêje: Gava win ji gel re dibêjin rabe, em bê erê na xwînê didin, lê gava em ji we dixwazin bibin yek, win gotina me nabîsin û dilê dijminê me xweş dikin. Ev jî hîç ne şertê xebata îjdil e û ne jî ji sinciyên parêzerên doza milet e.

## Lê digel her tiştî gel tevgera xwe bernade.

Gelê Kurd, digel her tiştî û her kêmaniyên rêvebiran, partiyan û perçebûna wan bi tevgera xwe re ye, pê ve girêdayî ye, ji dorê venakşê û herdem ji kar û xebatê re amade ye. Çinkî ew dizane ku pirseke siyasî ya mîna doza kurdî rewa, mezin û tevlehev, bê rêxistin û partî bi rê ve nare.

www.arsivakurdi.org

Opozisyona Ereb li Sûriyê wê roj ji rojê bêtir têbigihêje, li pirs û mafên gelê Kurd xwedî derkeve . Ji vê riyê derbas be, tu riyên dî li ber me nînin ku em karibin dîwarê şovenîzim û nijadperestiyê qul bikin, bînine xwar û rê li ber wekheviyê û mafên mirovan dûz bikin

*** Di rojên pêş de li Brukselê wê kongreyek li darkeve, ew weke berdewama kongra Washingtonê tê naskirin. Hevbindî daxweynek belav kir û got ku wê tu alî ji Hevbendî beşdarî Kongreyê nebin. Weke tê zanîn hûn li Washingtonê amade bûn؟**

Belê, di wê civata Waşintonê de hevalek ji rêxistina Holendayê bi erêkirina me beþdar bûbû bi hêviya ku em nasbikin çêrok çi ye û dûv re em karibin bi rolekî erênî rabin . Piştre me dît ku gotin û kirinên ew kesê ku li civata Waşintonê xweditî dikir û di pê re li ya Broksêlê hevdu nagirin, lewre daxuyaniya Hevbendiyê di derbareyî rûniştina Broksêlê de, helwesteke berpirsiyar, di ciyê xwe de, parta me jî, xwediyê wê bû .

*** Li dawiyê mesaja we çi ye؟**

Mesaja min ji xwendevanên zimanê dê re ew e ku, em tev li pêşgotina Nûredîn Zaza ya ku ji destana Memê Alan re nivîsîbû veger in, baş bixwînin û li ser biponijin . Rêz û silav ji rêvebiriya Malpera Avesta û xwendevanên wê re**.**

9/6/2006

## Dumahîk : Pirojeya kembera...

, balav kirin. Bi vê têkiliya hovane, Kurd di gundên xwe de birçî, tazî û perîşan man. Ji derdê vê xizaniya mezin a bêbext, gelek malbat neçar bûn ku malên xwe, gund û bîranên biçûkaniya xwe li şûn xwe bihêlin, berê xwe bidin bajarên mezin ên Sûriyê yan derveyî welêt da ku ji bo nanê zarokên xwe xebatê bikin. Gelek caran jî, karên giran û gemar ku tu kes qîma xwe bi wan nayne dikin. Di encam de, hin nexweşiyên civakî di nav Kurdan de peyda bûn, ewên ku pencên xwe di stuyê zarok, jin, mêr, pîr û kalan de kûr çikandine, ew birîndar û gêj kirine.!!!

Bi armanca pişaftin û tunekirina gelê me, wan berpirsiyarên qafteng û nêzbîn ev şerê aborî û siyasî yê mezin dij gelê me bi rêve birine, bê ku carekê ji xwe bipirsin ma gelo ev şerê mezin dij vî gelê bê sûc û gunehî aştîxwaz di rajeya(xizmeta) kê de ye ?!..

Lê, tiştê mirov matmayî dihêle ew e ku rijêma Sûriyê ta roja îro, ji van pilan û projeyên xwe yên ne mirovane hemberî gelê me venagere, wê zordestiyê ji ser singa wî ranake, mafên wî lê venagerîne û lêborînê jê naxwaze...!!!.

Di vê bîranîna reş û tal de, ji me tê xwestin ku em nakokiyên xwe ji hole rakin, xebata xwe ya aştiyane geş bikin. Pêşî em destên xwe bidin hev, gotina xwe bikin yek, paşê em di nav gelê Sûriyê de dost û alîgiran ji vê doza dadmend re peyda bikin, da em hemî bi hev re ji bo hilanîna van proje û pîlanên ne mirvane têbikoşin, azadî û wekheviyê di civaka Sûriyê de peyda bikin. 6/7/2006

*<u>Jêder</u>: Hejmar 15 ji rojnameya (Dengê Kurd)- dawiya tîrmeha 1973-an

www.arsivakurdi.org

# Çiyayê Kurmênc li ( 5 ) Tebaxa 2006 an
# Reş girêda

***Li roja şemiyê ( 5 ) î Tebaxa 2006 an , li ser nîvro bi beşdariya cemawerekî mmezin ji xelkê herêma Efrîna bi xemgîn û herêmên derdorê , termên ( 23 ) hemwelatiyên Kurd ( yên ku , bûne qurbana bombekirina ne mirovane yê balefirên Israîl , li ser sînora Sûriyê û Libnanê ) di goristana bajaroka Cindrrêsê de hatin veşartin.***

Di veşartinê de , ji berpirsiyarên dewlwtê yên fermî , parêzerê parêzgeha Helebê û miftiyê komarê hazirbûn , li aliyê din şandek ji rêber û berpirsyarên Partiya Yekîtî ya Demoqrata Kurd li Sûriyê jî beşdar bû û serên xwediyên wan pakrewwanên şrê hovîtiyê saxkirin .

Lê zarzimanê xelkê herêmê û hemî kesên dilpak , gotina siloganî ya dewletê şermezardikir ya ku , ta li cihekî weha herêm kurd , mirî kurd , goristan kurd û cemawer kurd dîsa jî bihna şofenîzma Erebî jê hildikelî lê dîsa kues bi dengekî bilind digot bila şerê Israîl ya hovane li ser libinanê bisekine , bila zarzimanê mêjî û aştiyê li şûn wê bigire .

Vaye emê li jêr navên wan kuştî û şehîdan bijmêrin :

1- Almaz Birîm – keça Mihemed – Şiyê ( gundê Erendê ) .
2- Esed sîdo – Erendê .
3- Şukrî weqas - Erendê .
4- Reşîd Ezet Me'idan - Erendê .
5- Ezîze Ezet Me'idan - Erendê .
6- Rojîn Hesen - Erendê .
7- Ferîd Hesen - Erendê .
8- Aytan Bekir - Erendê .
9- Henan Osman kurê şêx Heder – gundê Çolaqa .
10- Ebdilrehman Bekir kurê Ehmed Cemîl Horo – Çolaqa .
11- Mihemed Ebdo Elîko – Gundê Me'imila .
12- Mihemed Mihemed Elîko - Gundê Me'imila .
13- Mizgîn weqas – Baziya .
14- Ofê weqas - Baziya .
15- Nîdal Yaqûb lawê êbdilrehman – Birka .
16- Mihemed Yaqûb lawê êbdilrehman – Birka .
17- Hesen Eyûş lawê Cemîl – Şiketa .
18- Reşît Eyûş lawê Neşet – Şiketa .
19- Mistefa Eyûş lawê Neşet – Şiketa .
20- Mihemed Xemîs – Cindirêsê .
21- Hisên Reşît – Cindirêsê .
22- Wehîd Şêxo – Hmşelekê .
23- Mihemed Osman lawê Mihemed – Tirmûşa .
24- Ehmed Cemîl Horo – Çolaqa – ew jî li ( 6 ) Tebaxê hate veşartin .

Bi navê komîta rêvebir a weşana Newwrozê û xwendevanên wê em bi dengekî bilind vî şerî şermezardikin û şerê xwediyên kuştiyan çaxdikin û sebir û aramiyê jêre dixwazin .

www.arsivakurdi.org

# Gelê Libnanê
# di nav destê Isrîlê de diferfite!!

*Serdarê Bedirxan

Eve 11 roj in ku dewleta Israîlê bi bumbe, balefir, keştiyên mûçeavêj, tang û topan Libnan gulebaran dike. Pir, balefirgeh, rê û dezgehehên dewletê ji êrêşên xwe re kirine armanc, bi sedan kuştî û birînadar li kolanan û di bin kavilên avahiyên wêrankirî de mane, gel bê xwarin, derman û av ma ye, bê ku tukes ji civaka Erebî, Islamî û navnetewî di gazî û hawara wî de here, destê arîkariyê dirêjî wî bike!!.

Parta Hizbullah ya ku birêz Hesen Nesrellah serokatiya wê dike, beriya derdora du hefteyan, du leşkerên Israîlê revandin û dîl girtin, xwestin ku bi berdana herdu leşkeran, dîlên Parta xwe û yên Filestînê û Ereban ku di girtîgehên Israîlê de ne bêne berdan. Lê, dewleta Israîlê, ev yeka han ne pejirand, û dest bi şerê xwe yê giran kir.

Bêgomane ku gereke artêşa dewleta Libnanê li ser hemî qada welêt serdest be û berevaniyê di ber de bike, sînorên wî biparêze, nabe ku partiyek bi tena xwe xwedî hêz û leşker be, biryarê bi pêxistin û vemirandina şeran bide. Lê, bi herhawî, dewleta Israîlê bi kîneke reş agir bi ser serê gelê Libnanê de dibarîne, ya ku dibe egera kuştina zarok, jin û kalan...Ji hêla din ve, leşkerên hizbullah mûçeyan tavêjin bakurê Israîlê, û agirê vî şerî roj ji rojê gurtir dibe, jîna gel dibe dojeh. Bi rastî, ev şerê ha, şerekî gemar e, hovane ye, gereke bi lez bête rawestan û xwîna gelê Libnanê bête parastin, babeta çekên hizbullah di çarçewa guftûgoyên di navbera hêzên Libnanê yan civaka navnetewî de bête çareserkirin.

Ma qey hestên mirovatiyê bi mirovan re nemane?!!..Ma xwîna mirovan çiqasî erzan bûye!!..De bera deng û gumîna top û firokan ji guhê keç û lawên Libnanê bikeve, kalîn û nalîna birîndaran bête birîn, aştî û aramî konên xwe li seranserî Libnanê, vî welatê xweşik û şêrîn vegire!!

22/07/2006

*********************************

**Dumahîk : Di ber zimanê....**

belavkirin û di gelek malperan de cî girt.

Di daxuyanê de, hatibû ku, girtin û zîndan tu carî wê nebine kelem di riya liberxwedana di ber zimanê me yê dê de. Fêrbûna xwendin û nivîsandina bi zimanê me yê Kurdî, her dê bimîne erkek sereke ji yên netewî û navnîşana maf û rûmeta me ya mirivan e.

Çendî karbidestên dewletê di derbery zimanê me yê Kurdî de, dilteng û çavsor bin, ewqas heval, hogir, keç û xortên gelê me yê Kurd li Sûriyê, dê li zimanê xwe yê dê bêtir bibin xwedî. Û bêguman, dilê mezinan yên weke Celadet Bedirxan, Nûridîn Zaza, Osman Sebrî û Cegerxwîn, di gorê de, wê şa û geş bikin.

www.arsivakurdi.org

# *Pênasîn bi hin gewreyên dîrokê*



Bêthovên



Kêler



Sêrbets



Birevêl

**1 -Homîros** : Sala 850 î berî zayînê navê wî belav bû, tev kûrbûna wî herdu destanên dîrokî ( **Îlyeze – Odêse**) nivîsandibû. Hukariya wan dîrokî li wêjeya cîhanê bû.

**2- Dêmostîn** : Sala 384 an navê wî berz bû. Ew di karê konevaniyê de gelekî jîr û jêhatî bû , tev ku kekec bû ,lê gotbêjikî bi nav û deng bû.

**3- Mîgêl Sêbentês** : Sala 1547 an ji dayîk bû . di şerê Lêbento sala 1571 an destê xwe yê rastê hate birîn, wê hêşt jiyaneke bêzar di zeviyekê de biborîne , lê berhema wî bi navê **Donkîxot** ew xist payeke bilind di wejeya Îspanî de .

**4- Sere Pêrinherdêt:** Sala 1844 an ji dayîk bû . Lê, ji ber çoga xwe ya nexweş rûniştîbû, û sala 1914 an lingê wê di çogê re birîn . Digel rewşa wê rola xwe di lîstoka şanogeha Ferensî de mezin bû . Ew baştirîn lîstokvana şanoyê bi nav bû.

**5- Hêlên Kêlir**: Sala 1808 an ker û kûr ji dayîk bû û hê du salî bû fêrdaneke(mohadîre) serkewtîbû **,** û bi dehan pirtûkên wêjeyî nivîsandibûn û baştirîn perwerdeyek cîhanî bi nav bû **.**

**6- Liwîs bireyl**: Sala 1809 an ji dayîk bû . Piştî sê salan kûr bû û mamostakî hêja jê bi derket û alava çapmeniyê û nivîsadinê ji kûran re çêkir

**7- Çeriliz Şitenymîstêr:** Sala 1865 an xomir ji dayîk bû. Weke endezyarekî afrandar ji şîrketa Cinrel Motor re kar dikir û bêtirî / 200 / afirandin jê re pêşkêş kir û di Yonyon Kolêc de mamoste bû û daner bû.

**8- Cêms sorbir:**Sala 1894 an ji dayîk bû . piştî salekê di bûyerekê de çavekî xwe kûr bû , û di piş re yê din jî kûr bû . Gava ciwan bû di kovara Dîniyorkir û gelek pirtûk û destanên lîstokiyê(temsîl) nivîsandin û iskêç û filmên kerton çêkirin.

**9- Xorxê Liwês Burxês :**Helbestvan û çêroknivîs û rexnevanê Ercentînî ye , sala 1899 an ji dayîk bû û piraniya berhemên wî wergêrî Inglîzî bûn .tev jiyana xwe bi kûrî borand lê, di jiyana xwe de ji yên bi çav pirtir tişt û bûyer didît.

**10- Lodvîç Ven Bêthovên:**Sala 1907 an ji dayîk bû di temenê / 46 / an de ker bû. Di dawiya jiyana xwe de mozîk û sêmfoniyên sermed afrandin .

Rojnama El tişrîn 22 tebaxê 2006 An – hejmar 9645

**Zamdarê Zindî**

www.arsivakurdi.org

# Projeya Kembera Erebî li Cizîrê, derbasî sala 34-an dibe


**Rêberê Silîvî**

**B**i hatina roja Şemiyê 8/7/2006-an, projeya Kembera Erebî li Cizîrê derbasî sala 34-an dibe, xizanî, belengazî û perîşaniya Kurdan pê re dikeve saleke nû ji temenê xwe.

Raste ku evqas meh û sal di ser vê projeya ne mirovane re borî ne, lê, ji ber bandora wê ya mezin li ser jiyana gelê me, ew rojekê bi tenê jî nehatiye ji bîrkirin, û tucarî nayê ji bîrkirin.

Roja 8/7/1973-an, rojnameya(Albe,s), di hejmara xwe ya 3170 de, biryara çêkirina komîtekê ji berpirsiyarên parta serdest û dewletê weşand*, ya ku pê re 10 milyon p.s ji bo pêkanîna wê projeyê terxandibû, ew roj li nik Kurdan bûye rojeke reş û bê qidoş.

Dema projeya kembera Erebî û serhejmara awarte bi destê şoven û zikreşan bi hev re bûne heval, kambaxî û malwêraniyê li Kurdan dest daye. Ji hêlekê ve, Kurd ji nasnama welatê xwe bêpar bûne, dergehên xebatê li pêş wan hatine girtin, ji hêla din ve, xaka bav û kalên wan, bi darê zorê ji wan hatiye sitandin û li Erebên ku, ji derdora parêzgeha Heleb û Reqayê li Cizîrê hatibûn cîwarkirin, **D.R.(12)**




مصور منطقة مشروع "الحزام العربي" على خارطة سوريا

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org